



DİYARBAKIR SİYASAL VE SOSYAL
ARAŞTIRMALAR ENSTİTÜSÜ


ENSTİTUYA DİYARBEKİRÊ BO
LÊKOLÎNÊN SIYASÎ Û CIVAKÎ

DİYARBAKIR INSTITUTE FOR POLITICAL
AND SOCIAL RESEARCH

BERÎ HER TIŞTÎ ZIMANÊ DAYIKÊ

1

RÊZEBELAVOKÊN BERÎ HER TIŞTÎ ZIMANÊ DAYIKÊ



Kurt İsmail Paşa
2. Sokak
Güneş Plaza No:18
21100 Yenişehir
Diyarbakır
Türkiye
T: +90 412 228 14 42
F: +90 412 224 14 42
www.disa.org.tr
info@disa.org.tr



**DİYARBAKIR SİYASAL VE SOSYAL
ARAŞTIRMALAR ENSTİTÜSÜ**

**ENSTİTUYA DIYARBEKİRÊ BO
LÊKOLİNÊN SİYASÎ Û CIVAKÎ**

**DİYARBAKIR INSTITUTE FOR POLITICAL
AND SOCIAL RESEARCH**

**BERÎ HER TIŞTÎ ZIMANÊ DAYİKÊ
WEŞANÊN DÎSAyê**

ISBN: 978-605-5458-03-4

Belavoka Berî Her Tiştî Zimanê Dayikê perçeyêke projeya salane ya Bilindkirina Hişmendiyê derheqê Zimanê Dayikê û Duzimanî di Perwerdeyê de ye ku ji şeş hejmaran pêk tê ku bi destê Enstituya Diyarbekirê bo Lêkolînên Siyasî û Civakî (DÎSA) tê birêvebirin. Di van belavokan de derheqê mijarên wek têkiliya perwerdehî û zimanê dayikê, cihê perwerdeya ser esasa zimanê dayikê di xelaskirina newekheviyan de, cihê zimanê dayikê di jiyana civakî, kulturî û siyasî de agahiyên kêrhatî pêşkêşî gel bike. Hûn dikarin belavoka dumehî li ser malpera www.disa.org.tr peyda bikin.

Nivîsarên di vê belavoka me ya yekem de cih digirin ji xebata bi nave Insights Education ku ji aliyê Zanîngeha Sussexê Enstitûya Lêkolînên Pêşdebirinê hatine girtin û wergerandin bo kurmancî û tirkî. Wergêrên kurmancî û tirkî bi destê Şerif Derince hatine kirin, di tirkîkirina wan de keda Dilan Bozganê, kurmancîkirina wan de ji ya Ergin Öpenginî gelek giring in. Her wiha endamên DÎSAyê me ji di naveroka nivîsaran de tevkeriyên heja kirine. Ji aliyê rupelsazî û bergsaziyê de jî em gelek spas dikin Emre Senan. Em gelek spas dikin Veysel Aydeniz bo fotografên wî.

Ji kerema xwe herin rupela www.disa.org.tr/berihertizimanedayiket.pdf an jî me agahdar bikin ji bo ku belavoka me bi dest bixin. Ji bo inglîziya nivîsaran binêrin: www.id1.org/insights/insights-edo5/index.html

Çap: Ege Basım Matbaa ve Reklam Sanatları

Copyright © Nisan 2011

Belavoka Berî Her Tiştî Zimanê Dayikê wek gavekê projeya Enstitûya Diyarbekirê bo Lêkolînên Siyasî û Civakî (DÎSA) ya bi navê Bilindkirina Hişmendiyê derheqê Zimanê Dayikê û Duzimanî di Perwerdeyê de ku piştgiyariya fona Matra'yê ya Balyozxaneyê Holandê wergirtiye di bin berpirsiyariya Şerif Derince de hatiye amadekirin. Dibe ku fikr û dîtinên di belavokê de cih digirin yek bi yek bi yê DÎSA û Balyozxaneyê Holandê ji hev negirin. Tî astengî û rêgirtin tune li ber zêdekirin û belavkirina belavokê de tenê heke çavkanî bête destnîşankirin bi awayekê ron û zelal.

Bi arîkariya,



Kingdom of the Netherlands

**BERÎ HER TIŞTÎ
ZIMANÊ DAYIKÊ**



Mafê xwendekaran bo perwerdeya bi zimanê dayikê

Perwerde hêzek e û ziman yek ji amrazên ghiştina bi wê hêzê ye. Perwerdeya bi zimanê dayikê jî bixwebaweriyê zêdetir dike, dihêle ku zarok dilşad û bextiyar bibin, xwe bi dilê xwe derbibirin, zêdetir tevî danûstandinên civakî bibin, xewn û xeyalên xwe binexşînin û par bikin û afirîner bin.

Etnîsîte (qewm), ziman û kultûr bi rengekî peyt bi hev ve girêdayî ne. Bi heman rengî, ev têgeh bi newekhevî, cudakarî û dubendiyan/şeran re jî pêwendîdar in. Ji ber ku gelek welat pîrçewmî û pîrzimanî ne, bîr û boçûnên derheqê awayê dabînkirina perwerdeyê, naveroka mîfredatê û zimanê hînbûn û hîndekariyê, her wekî ji van nîqaşan tê dîtin ku heyamek e li ser perwerdeya bi kurdî bi rê ve diçin, gelek caran bi rik û serhişkî tîn parastin û derbarê wan bîr û boçûnan de nîqaşên germ û har tîn kirin.

Zimanên komên bijarte (elît), civakên zorîne, û kolonyalistên berê û yên nû, pîrrî caran zimanên “ên din” dixin bin tehekkûmên xwe, nemaze di saziyên fermî yên wekî dibistanan de. Li Tirkiyê, rewşa kurdî û ya gelek zimanên din jî bi heman rengî ye. Lê êdî gelek baştir tê zanîn ku zarokên bi zimanê xwe yê dayikê (mirov dikare bêje zimanê yekem an jî zimanê malê jî) dest bi perwerdeyê dikin, xwedî hêz û paşxaneyêke çêtir in û ihtimala serkeftina wan a li dibistanê zêdetir e, lewre ew zimanên dikarin zimanên din zûtir û baştir fêr bibin. Lêkolînên ku van salên dawî di nav xwendekarên kurd de hatine birêvebirin jî vê yekê piştrast dikin.

Li aliyê din, ji bo zarokên ku zimanê wan ê dayikê hatiye vederkirin ji warê perwerdeyê û hatine mecbûrkirin bo perwerdeya bi zimanekî biyanî (an jî zimanekî duyem) gelek zehmet e dersên li dibistanê bi rêkûpêkî bişopînin. Astengiya zimanê perwerdeyê gelek caran têrê dike ku zarok qet dest bi xwendinê nekin, lê heke dest pê bikin jî dibe sedema pêşhatina gelek zehmetiyan, şkestina hewesa wan, dubarekirina sinifê (ketin) an jî berdana dibistanê. Kêşeyên wek rêjeya zêde ya dubarekirina sinifê û berdana dibistanê, encamên pîr nîzm û lawaz ên di ezmûnên navendî yên wek SBS û OSS de li Tirkiyeyê, nemaze li wan deverên ku zêdetir xwendekarên kurd lê ne, piştgriya vê tesbîtê dikin.

Ev belevoka ku ji kurtenivîsarên ji lêkolînên akademîk hatiye berhevkirin, balê dide ser numûne û muneqeşeyên li cihanê derheqê pîrsên bikaranîn an bikarneanîna zimanê dayikê di perwerdeyê de. Digel ku xebat û lêkolînên behsa wan tê kirin derveyî kurd, kurdî û Tirkiyeyê jî bin, pîrsên hatine destnîşankirin, encamên civakî, siyasî, zimanî û perwerdeyî ku ji van pîrsan dertên, zêde ne cuda ne ji rewşa kurdî û Tirkiyeyê. Ji ber vê yekê, mirov dikare van nivîsaran bi çavekî muqayeseyî bixwîne li gel rewşa kurdan û kurdîyê li Tirkiyeyê.

Pirs û pirsgirêk çi ne?

Li gor lêkolîn û xebatan, li cîhanê nêzîkî 7000, li Tirkiyeyê jî zêdeyî 25 zimanan hene. Di rewşeke wiha de çiqas rast e ku mirov li bendê be hemû zarok bi zimanê xwe yê dayikê dest bi xwendinê bikin? Zehmetî û maliyet çi ye bo wezaretê perwerdeyê û saziyên pêve girêdayî ku ji bo her zimanekî, zimanê xwendin-nivîsandinê pêk bînin, mifredatê amade bikin, mamosteyan bigihînin, alav û navgînên dersan durist bikin? Heke malbatên ku zimanên wan hatine dewsandin û vederkirin bixwazin zarokên wan bi zimanê zal/serdest perwerdeyê bigirin, gelo divê mirov guh bide bisporiya pedagojîyê û têkoşînên ji bo parastina ziman hatine kirin, an guh bide malbatan bi xwe?

Menfaatên bikaranîna zimanê dayikê di perwerdeyê de çi ne?

Peymana Neteweyên Yekgirtî (NY) bo Mafên Zarokan beyan dike ku her zarok xweyî mafê perwerdeyê ye (bend 28) û xweyî hînbûn û bikaranîna zimanê malbata xwe ye (bend 30). Li gor Tove Skutnabb-Kangas, cihê ku zarok bi zimanekî biyanî bînin perwerdekirin, çi ji ber tercîha malbatan be çi ji ber ku rêyekê din nehatibe dabînkirin, mafê zarokan tê binpêkirin. Di heman demê de, tê zanîn ku heke ziman neyên parastin dê winda bibin (texmînên ser leza windabûna zimanan ji hev cuda ne) û zanyarî û aqilê di wan zimanan de hatiye kodkirin jî tevî wan zimanan winda bibin. Lêkolînên li Tirkiyeyê hatine birêvebirin jî nîşan didin ku di nav cîmaetên ji xeynî tirkî-axêv de windabûna zimanê dayikê ya navnîfşî gelek bilez e.

Xavier Albo modeleke serketî ya perwerdeyê pêşniyar dike bi navê “Perwerdeya Navkultûrî û Duzimanî”, ku li Boliviyayê tê sepandin, bi vê modelê zarokên binkî-xwecih (indigenous) gelek kêmtir bi dubarekirina sinifê re rûbirû dimînin û netîceyên baştir ên akademîk bi dest dixin li dibîstanê. Bi gotinên Carol Benson, ku bispore mifredatên duzimanî ye, modelên perwerdeya duzimanî yê ser esasê zimanê dayikê li Gine-Bissauyê, Nijer û Mozambîkê, destnîşan dikin ku ev model bi taybetî tecrûbeyên xwendekarên keç di perwerdeyê de bi awayekî erênî vediguherînin, cih vedikin bo malbatan ku tevî perwerdeya zarokên xwe bibin û xwendekarên keç bikarin xwe bigihînin perwerdeyeke kêrhatîtir.

Heke xwendekar di demeke kurt de derbasî zimanê duyem bibin, ev perwerdeya duzimanî ye?

Encamên lêkolînan diyar dikin ku divê xwendekar ji perwerdeya ku bi zimanê dayikê dest pê dike zû bi zû derbasî zimanê duyem nebin. Piştî berhevkirina encamên lêkolînan li 29 welatên Efrîqayê hatine birêvebirin, Kathleen Heugh digihe van encaman ku modelên kurte-heyamî (xwendekar ji salekê heta 3 salan bi zimanê xwe yê dayikê dest bi xwendin-nivîsandinê dikin û dû re derbasî zimanê zal/serdest dibin) bo maweyekî kurt kêrhatî ne, lê ji ber ku zarokan bi lez û bez derbasî zimanê duyem dikin faydeyên heta hingê bîdestketî bi sala 5ê ve dîsa ji dest diçin. Faydeyên saxlem yê perwerdeyeke ser esasê zimanê dayikê hatiye bicihkirin, tenê di modelên dirêje-heyamî de tînin ku ev model herî kêrhatî jî 6 heta 8 salan dom dikin; faydeyên mayînde û esasî jî, ancax tînin wexta xwendekar bikarin bi zimanekî din (zimanê duyem) ders û mijarên mifredatê bişopînin, ango piştî perwerdeyeke ser esasê zimanê dayikê ya 10 an jî zêdetir salan.

Gelo perwerdeya duzimanî dikare were birêvebirin?

Susan Malone ser modelên serketî yê perwerdeya bi duzimanî yê li gelek deveran dinivîse



û diyar dike ku ev model li cihên ku zimanên kêmneyan tevî zimanê cemaeta zorîne lê tîn axaftin, ji bidestxistina axaftineke rewan bi zimanê dayikê û bixwebaweriyê dest pê dike û dike ku xwendekar xwendin-nivîsandinê ewil bi zimanê dayikê fêr dibin û paşî zimanê duyem lê zêde bikin. Di van modelan de, cihê lêzêdekirina zimanê duyem an yê seyem û awayê lêzêdekirinê diguhure li gor mifredat, daxwaz û pêdiviyên xwendekaran, mamoste û materyalên heyî û hwd. Lê dîsa jî di pratîkê de gelek modelên serketî yên perwerdeya duzimanî hene ku hem xwendekarên ji malbatên feqîr û hem jî yên malbatên dewlemend beşdariyê lê dikin.

Gelo mesrefa perwerdeya duzimanî zêdetir e?

Raport-analîzeke mesref-faydeyê ku sala 2006ê ji bo Cîvîna Wezaretên Perwerdeyê Li Efrîqayê hatibû amadekirin nîşan dide ku ew bernameyên perwerdeyê yên ku bi zimanê dayikê dest pê dikin û pê de pê de cih didin zimanên din zêdetir tesserûfê dikin ji perwerdeya yekzimanî. Her çend wisa tê gumankirin ku ev bernameyên duzimanî zêdetir pere dimezêxin, her ku diçe mesrefên wan kêmtir dibin û tesserûf (bo numûne, tesserûfên ji mesrefên dubarekirina sinifê) ji mesrefên zêdeyî yên destpêkê wêdetir diçin.

Qanûn-danan têrê dike?

Sheila Aikman aloziya pêwendiya ziman û nasnameya qewmî û girêdana wan nîşan dide. Her wekî mînakê kurd û zimanê kurdî, wexta têkoşîna milletên bindest bo vejandina zimanê xwe tevî têkoşîna wan a berfirehtir bo edaleta civakî û xweseriyê dibe, ew millet dixwazin xweyî bernameyên perwerdeyê yên wisa bin ku ji rexekî ve lêhatî be bi kultura wan re û ji rexê din ve jî cih çêke ji bo zarokên wan ku bikarin hem tevî pêvajoya pirçandîya cihanê bin û hem jî ji vê pêvajoyê sûdê wergerin. Lê ev yek tenê bi guhertina qanûnan ve bi ser nakeve. Weku Dhir Jhingran û Shireen Miller nîşan didin, digel ku qanûnên Hindistanê pêşniyar dike ku di dibistanan de zimanê dayikê bê bikaranîn, gelek ji xwendekarên mensûbên zimanên bindest bi zimanekî duyem tîn “yekzimanîkirin bi rêya xeniqandinê”, an jî zimanê wan zarokan tenê bi awayekî nefermî di fêrgehan de tîn bikaranîn. Gavên wek nexşekirina zimanan¹, zêdekirina çavkaniyên xebatên lêkolînî û perwerdeyî jî pêwîst in ji bo ku politikayên perwerdeyê veguherin pratîkê.

Gelo ziman mifteyê perwerdeyê ye?

Li gor lêkolînan, xîzanî û cudakarî hêj jî sedemên sereke ne ji newekhevîyên ji ber gihîştina bi îmkana perwerdeyê; şertên malbatê (an jî cûreyê malbatê,) (asta perwerdeyê û çîna civakî jî nav de) nîşaneyê esasî ye di serkeftina dibistanê de. Wexta pêkerên (faktor) mîna mifredat û wesfê hindekariyê, hebûn û nebûna mamoste û çavkaniyên hindekariyêke rêkûpêk bîn venihartin (kontrolkirin), gelek zehmet e ku tesîra ziman tenê bê pîvîn ser serketina perwerdeyê. Bes, modelên perwerdeyê yên du/pirzimanî yên li ser esasê zimanê dayikê, di perwerdeya zarokên ji zimanên kêmneyan de xwediyê roleke bingehîn in. Perwerdebûna bi zimanê ku zarok herî zêde pê hêmin in, fersend û îmkanên di jiyandê wan da pir zêdetir dike. Ji perspektîfa ser esasê mafan, em dizanin divê çima perwerdeya du/pirzimanî pêk were. Ji rexê pratîkê ve, li cîhanê gelek mînakên serketinê – Finland, Katalûnya, Welatê Baskê, Papua Gineya Nû, Eritre, Nîjerya, Guatamala, Malî û Bolîvya – nîşan didin ka perwerdeyêke wisa çawa dixebite. Vêga, divê çî bê kirin?

- Rêxistinên siyasî yên xema têkoşîna bo ziman dixwin û saziyên sîvîl, mamoste, perwedekar, kesên ku zimanê wan ê dayikê ji zimanê fermî cuda e lê tenê bi zimanê fermî perwerde dîtine û her kesê ku qîmet dide dewlemendiya zimanî û perwerdeya pîrzimanî dikarin çalakî û xebatên xwe zêdetir bikin ku agahdariya civakî geştir bikin.
 - Çîrokên serketinê yên gelek welatên cuda meydanek e ku divê sûd jê bê wergerin û numûneyên serketî dibê bîne adaptekirin li gor şertên welatên ku bi heman dereceyê piştgiyariya siyasî nabînin.
 - Mirov dikare rê û rêçikên din (boykotkirina dibistanê û perwerdeya bi kurdî li malan jî di nav de) biafirîne bo dayik û bavan ku roleke çalaktir bilîzin di perwerdeya zarokên xwe de.
 - Lêkolîner dikarin van mijaran di civînên navneteweyî yên li ser perwerdeyê û raportên pêşketinê de bidin munaqeşekirin.
 - Rêyên wê yekê dibin bîne peydakirin ku fişar û zext saz bibe li ser hukûmetan da ku pêngavan bavêjin ji bo dariştina pîlanên û terxankirina çavkaniyan.
- Nêzîkî 1.38 milyar insanan, bi zimanên binkî diaxivin, bi gotinekê din bi zimanên ku kêmîr tînan nasîn, hêj nebûne zimanê nivîsê û bêpar in ji perwerdeya fermî. Ev hejmar teqrîbî 221 milyon zarokan jî dihewîne ku di temenê dibistanê de ne. Perwerdeya ser esasê zimanê dayikê dikare fersenda perwerdeyeke biwesiftir bide wan kesan û hemû mirovên ser rûyê erdê.

Şerif Derince – *Enstitûya Diyarbekirê bo Lêkolînên Siyasî û Civakî*

*Çarçoveya giştî ya vê nivîsarê ji aliyê Katy Webby bo belavoka bi navê Insights Education ya Zanîngeha Sussex Enstitûya Lêkolînên Pêşdebirinê hatiye amadekirin û di kurdîkirina wê de hin lêzêdekirin û guherîn hatine kirin bi armanca adaptekirina li reuşa kurdîyê û Tirkiyeyê.

Ji bo belevoka jêder binêrin:

www.multiculturas.com/textos/insightsEdn5_Mother_tongue_first_2006.pdf

¹Eu term di îngilîzî de wek "language mapping" bi tirkî jî wek "dil haritalandırması" tê pênasekirin. Mebest bi nexşekirina zimanan ev e ku nexşeya axêverên zimanekî, taybetî û sehên wan axêveran, cih û warên wan û hwd bê destnîşankirin.



Qirkirina Zimanî?

Mafê zarokan ê perwedeya bi zimanê dayikê

Em ji her çaxê bileztir zimanan dikujin. Heta 2100ê, dibe ku %90-95ê 7000 zimanên ku îro hêj dijîn winda bin an jî nîfşên nû hîn wan nebin.

Piraniya zimanên di xetereyê de, ji aliyê qebîleyên binkî ve tên axaftin û heke bi rêka perwerdeyê an çareyên din neyên bihêzkirin dê winda bin. Ku Perwerde bo Herkesî (PBH) pêk were, di demeke kurt de birrek zarok dê dest bi dibistanan bikin. Lê piraniya zarokên binkî û yên kêmîne (û her wekî li Efrîqayê, zarokên ji cimaetên zorîne ku welatên wan zimanekî rojavayî wek zimanê fermî pejirandine) mecbûr tên hêlîştin ku bi zimanekî ne aîdê wan perwerde bigirin. Rêkeke din jî tune bo wan çunkî dibistan nînin ku bi zimanê wan ê dayikê perwerde bidin.

Tevî delîlên zanîstî yên derheqê duzimanî û hînbûnê de û bi rengê ku mafê perwerdeya bi zimanê ku herî baş fahm dikin (yanî zimanê dayikê) binpê bikin, gelek malbat û siyasetmedar perwerdeya bi zimanekî zal (piranî bi îngilîzî) “çêtir” dibînin.

Windabûna fersenda perwerdeyê

Hinek lêkolîner dibêjin ziman “ji xweda ve” winda dibin û diçin, ji ber ku nikarin xwe li çaxa teknolojiyê ya post-modern biguncin (adapte bikin) an jî axêverên wan zimanan bi dilê xwe dev ji wan berdidin bi armanca ku xwe bigihînin zimanên din ku bi saya wan derfetên çêtir bi dest bixin. Bi fikra derfetên îş û kar û paşeroja perwerdeyê, dayik û bav dest dikêşin ji xebardana bi zimanê xwe di malên xwe de. Tu kes bo vê nayê sûcdarkirin ji ber ku wisa tê bawerkirin ku menfaetên zarokan wan dide kirin. Baş e, menfaeta zarokan ev e? Gelek lêkolînen li gelek welatên cihanê bi zarokên binkî û kêmîneyî re hatine birêvebirin nîşan didin ku wexta zimanekî zal bibe tekane an sereke zimanê perwerdeyê, netîceyên giran ên neyînî pêk tînin bo zarokan. Du mînak dê mebesta me zelaltir bikin: Li Kanadayê, zarokên Inuît ên ku bi îngilîzî perwerde dibînin encax piştî perwerdeya 9 salan dikarin bigihin asta sinifa 4ê; bi heman rengî mezintirîn astenga ber perwerdeyê serketî bo zarokên Aborjîn li Awustralyayê zimanê îngilîzî ye.

Li rexê din, lêkolîn dest nîşan dikin ku;

- Zarok baştir hîn dibin wexta perwerdeya xwe bi zimanê ku baş dizanin bigirin.
- Li Emerîkayê berevajî zarokên diçin dibistanên ku tenê bi îngilîzî ders didin, zarok zûtir îngilîzî hîn dibin û di xwendina xwe de serketîtir dibin dema diçin dibistanên ku ser esasê duzaminîyê perwerde didin.
- Li gor mezintirîn lêkolîna ku heta niha bi xwendekarên mensûbê zimanên kêmîneyî hatiye birêvebirin, yên ghiştine baştirîn rêjeya duzimanîtiyê û di dibistanan de serketî bûne ew

zarok in ku bo demeke têra xwe dirêj bi zimanê xwe yê dayikê perwerde dîtine.

Windabûna zanyariyên pêwist bo jîndariyê

Di deverên wekî rêlên baranê li Amazon, Borneo û Papûa Gineya Nû de tenê cemaetên binkî û yên edetî dijîn. Wexta zimanên van cemaetan winda dibin, zanyariyên derheqê parastina deverên dewlemend jî winda dibin û diçin. Ev zanyariyên ku saloxên derbarê dewamkirina jiyanyariya insanî jî nav xwe de dihewînin (wek giyayên bo meseleyên tibbî) jî winda dibin, lewre ew ziman nehatine danivîsandin (koddikirin). Ji ber vê yekê, ya rastî bi rêya kuştina zimanan, em şert û mercên pêwist bo jiyanyariya ser rûyê dinyayê jî xelas dikin.

Mirov dikare windabûna zimanan wek encamekê qirkirina zimanî bibîne. Mecbûrkirina zarokên binkî û yên kêmine ku bi zimanekî ji wan re nenas perwerde bigirin, dikeve nav çepera du ji pênc pênaseyên Peymana Pêşgirtin û Cezakirina Cirmê Qirkirinê (E793, 1948) ku qirkirinê terîf dikin:

Xal II (e): Veguhastina zarokên mensûbê cemaetekê bo cemaetekê din; û xal II (b): pêşvekirina xesarên giran ên fizîkî û giyanî ku mensûbên cemaetekê bigirin.

Divê zarokên binkî û yên kêmine bi zimanê xwe yê dayikê perwerde bigirin û zimanê fermî yê welatê ku lê dijîn wek zimanê duyem bi rêka perwerdeyeke rêkûpêk hîn bibin. Divê zarok, zimanê duyem hîn bibin, îlaweten zimanê xwe yê dayikê, ne ku şûna wan.

Tove Skutnabb-Kangas

*Zanîngeha Roskilde, Denmark
Zanîngeha Akademiya Abo, Fin.
skutnabbkangas@gmail.com*

Her wiha lê binêrin: *Genocide in Education – or Worldwide Diversity and Human Rights? (Qirkirin di Perwerdeyê de – an jî Pircûreyî û Mafên Mirvan Sertaserê Çihanê?) Mahwah, New Jersey: Lawrence Erlbaum, aliyê Tove Skutnabb-Kangas, 2000.*



Zayend, Ziman û Beşdarîbûn

Perwerdeya ku bo cemaetên serdest hatiye amadekirin, xwendekarên din li derve dihêle. Keç nemaze pê diêşin ji ber berpirsiyarên xwe yên malî û seh û meylên destnexweş yên malbat û mamosteyan.

Çavdêrî û delilên bidestketî ji lêkolînên welatên cihê dest nîşan dikin ku stratejiyên beşdarîker yên di perwerdeya bi duzimanî ya ser esasê zimanê dayikê de tîn bikaranîn ji kuran zêdetir faydeyan didin keçan. Vekolînên li Gîne-Bissaus, Nîjer û Mozambîkê gihîştine wan encaman ku zêdetir keç beşdarî dibistanên duzimanî dibin, kêmtir sinifan dubare dikin û dirêjtir berdewam dibin di xwendina xwe de ji keçên ku diçin dibistanên yekzimanî. Divê zêdetir lêkolînên çendanî û çawanî (quantitative û qualitative) yên daneyan bi zayendê jihev vediqetînin bîn birêvebirin, lê çavdêriyên pir ron hene nîşan didin ku keç ji hînbûna bi zimanê xwe yê dayikê fayde digirin ji ber çend sedemên wek:

Zêdetir qeydbûna keçan

Malbat zêdetir bawerîya xwe bi perwerdeyê tînin heke keçên wan biçin dibistanên ku bi zimanekî nas dersan bi rê ve dibin, nexasim wexta rêz bê girtin li nirxan wan yên çandî. Di heman demê de, her wekî li Barâ û Gîne-Bissaus, bîr û baweriyên edetî jî dikarin bîn guhartin: perwerdeya bi duzimanî gelek dê û bav qanîh kirine ku keçên ku perwerde dîtine dikarin hêj baştir beşdarî jiyana civakî bibin, bibin dê an jin û cihekî baştir bi dest bixin di jiyana xwe de.

Zêdetir tevlibûna dê û bavan

Danûstandineke qewîrî dê û bavan han dide ku bi mamosteyên zarokên xwe re biaxivin, piştevaniya hînbûna zarokên xwe bikin û zêdetir tevli biryargirtinê bibin di dibistanên wan de. Bo numûne, dê û bavên zarokên duzimanî yên Xai-Xai li Mozambîkê tevli selihkirina der û dora dibistanan bûne û tevkariya guhartina mifredatê kirine.

Kêmtir îstîsmara keçan

Mamosteyên mêr zêdetir bin sehiya civakî ne gava ji cemaeta zimanî û çandî ya xwendekarên xwe bin û her wiha kêmtir ihtîmal e ku keçan ji rexê cinsî an rexekê din îstîsmar bikin. Li Mozambîkê, mamosteyên duzimanî bi termên xizmatiyê wek “mam” û “xal” dihatine gazîkirin û di nav tîkiliyên nêzîktir de bûn bi dê û bavên xwendekarên xwe re, berevajî mamosteyên ku tenê bi portekîzî xeber didan.

Perwerdeya ser esasê zimanê dayikê her wiha tesîrê li başbûna derûnî ya keçan jî dike. Keç baştir hîn dibin, îtibareke zêdetir bidest dixin, xwebaweriyê pêk tînin û dibin xweyî hêvî û xiyalên bilindir bo paşerojê ku ev hemû pêkve rê didin ku serketineke zêdetir bi dest bikeve di dersan de.

Bernameyên perwerdeyê yê li ser rexên qewî ên xwendekaran saz dibin, bi gotineke din ser zimanê ku xwe rihettir pê derdibin, fayde digihîne hemû xwendekaran, lê zêdetir keçan.

Carol Benson

*Zanîngeha Stockholmê Navenda Hînbûn û Hindekariyê, Swêd,
carol.benson@upc.su.se*

Her wiha lê binêrin: *Girls, Educational Equity and Mother Tongue-based Teaching*, by Carol Benson, UNESCO, Bangkok, 2005 www2.unesco.org/elib/publications/Girls_Edu_Equity



Perwerdeya bi Zimanê Dayikê Kêm-mesreftir e

Ji xeynî hincetên din, polîtîkadaner li dijî perwerdeya bi zimanê dayikê radibin bi baweriya ku ew dê bibe sedema zêdetir mesrefan di perwerdeyê de. Lê ya rastî, dikarin teserûfên berketî bikin bi bikaranîna zimanê dayikê di perwerdeyê de.

Zarokên ku bi zimanê xwe yê dayikê perwerde dibin kêmîr dev ji dibistanê berdidin û kêmîr sinifên xwe dubare dikin ku ji zarokên bi zimanê xwe dest bi perwerdeyê nakin di dibistanên edetî de. Serincek bi ser aliyê darayî yê bernamêyên ser esasê zimanê dayikê perwerde didin destnîşan dike ku ew qîsme bernamê dibe ku bi zêdetir mesrefan bîn dirustkirin, bes mesrefên derbasbûna perwerdeya bi zimanê dayikê hingî ku tê zanîn zêde nînin. Ew in mesrefên ku zêdetir in ji yê bernamêyên yekzimanî yê edetî ew in:

- Pêkanî û pêşxistina elîfbê û zimanên kêmîneyî bo bikaranîna akademîk,
- Nivîsandin, pêşxistin û çapkirina materyal û kitêbên dersan,
- Damezrandina bernamêyên gihandina mamosteyan ji bo xwendekarên ku dê di beşên Perwerdeya bi Zimanê Dayikê de bixwînin,
- Baştir hînîkirina zimanê zal/serdest wek zimanê duyem.

Wisa tê texmînkirin ku derbasbûna sîstemeke ser esasa Perwerdeya bi Zimanê Dayikê (PZD) dibe sedî çar an pênc ê budceya perwerdeyê ya dewletekê. Lê belê, mesrefên bo gihandina mamosteyan bo PZD bere bere kêmîr dibin.

Wexta ku bernamêyeke gihandina mamosteyan tê dirustkirin û ceribandin, êdî ew dibe perçeyekî sîstema giştî û cihê xwe digire. Her wiha, mesrefên kitêb û materyalan jî dibin perçeyê mesrefên giştî yê perwerdeyê. Piştî ku bîn amadekirin, êdî tenê nûkirin û jinûveçapkirin hewce dike, wekî hemû kitêban. Li rexekê din, PZD dike ku mesref kêmîr bibin bi rêya kêmîrkirina dubarekirina sinifê û terikandina dibistanê. Wexta ku kêmîr zarok perwerdeya xwe nîvco bihêlin ji ber dubarekirin û terikandinê, kêmîr wext (û mesref) hewce dibe ji bo ku heman hejmarê zarokan ji perwerdeya bingehî derbas bibe. Xêr û bêreke din jî ew e ku heke xwendekar zêdetir û dirêjtir di perwerdeyê de bimînin, dê şansê wan zêdetir bibe ku îş û emelên baştir sûdmendtir bi dest bixin û ew yek jî dê di menfaeta wî welatî de be.

Li welatên Guatemala û Senegalê çapkirina kitêban bi zimanên mehelî zêdetir mesrefan derdixe, bes ne hingî ku tê îdiakirin. Li Guatemalayê sedî 0.13ê budçeya heyî ya perwerdeyê li kitêbên dersê diçe. Li rexê din, wisa tê texmînkirin ku teserûfên ji kêmîr dubarekirina sinifê û terikandina dibistanê bi saya PZD salê ji 5.6\$ milyonan derbas dibe û ew jî dikare rê bide ku zêdetir budce were danan bo perwerdeyê.

Pêşniyar

- Divê sazî û hikûmet zêdetir çavkaniyan terxan bikin bo PZD. Ji bo ku armancên Perwerde bo Herkesê bîn bicihanîn, hemû sîstemên perwerdeyê xwe amade bikin bo sistemeke ku zû bikare bê guhertin û baş hatiye dirustkirin bo gihandin, pêşxistin û wergirtina mamosteyan.
- Divê hikûmet piştgiriya demdirêj bidine PZD ji ber ku fayde û teserûfên bi vî rêkê bêne bidestxistin dê tenê piştî wextekê bêne dîtin. Loma, bernameyên PZD dikarin bêtir ser bikevin li cihên ku zêdetir xweyî aramî û îstîqrara sîyasî ne.

Helen Pinnock

Zarokan Biparêzin, *Qraliyeta Yekgirtî, kurtkirin Kathleen Heugh*
www.adeanet.org/biennial-2006/doc/document/B3_1_MTBLE_en.pdf (Chapter 8)

Xebat û Lêkolînên Derbarê Mijarê de Hatine Çapkirin li Tirkîyeyê

DİSA

Kula Ziman: Kêşeya Bikarneanîna Zimanê Zikmakî di Perwerdeyê de û Serhatiyên Xwendekarên Kurd, 2010. <http://disa.org.tr/arastirmalar.html?file=files/images/Dil%20Yarasi.pdf>

EĞİTİM - SEN

- Bikaranîna Zimanê Zikmakî û Duzimanî di Perwerdeyê de û Sehî û Dîtinên Gel Lêgerîna Tirkîyeyê*
<http://www.egitimsen.org.tr/download/ANADIL-ANA%20RAPOR.pdf>
- Sempozyuma Zimanê Zikmakî 1 û 2*
- Perwerde di Ciwakên Pîrzimanî û Pîrçandî de, Komciwîna Enqereyê, 2004*

ENSTITÛYA KURDÎ YA STENBOLÊ

- Mafên Zimanî û Polîtîkayên Zimanî, Pêşkêşiya Konferansa Perwerdeya bi Zimanê Zikmakî, 2003 / Amed*
<http://www.enstituyakurdi.org/dokuman/tebligoo1.pdf>
- Li Tirkîyeyê Rewşa Zimanê Kurdî, Danezana Konferansa Zimanê Kurdî, 2004 / Amed*
<http://www.enstituyakurdi.org/dokuman/danezano05.pdf>

ERĞ

- Duzimanî û Perwerde*
www.egitimdehaklar.org/pdf/6.pdf
- Duzimanî û Perwerde li Tirkîyeyê: Pengavên Çareseriyên Domdar*
www.egitimdehaklar.org/pdf/8.pdf

MRG

Jibîrkirin an Asimilasyon?
www.minorityrights.org/download.php?id=953

TARİH VAKFI

- "Ji Min Tişteke Tîne Vira, Mamoste?" Di Pêvajoya Perwerdeyê de Nasname, Lêkdan û Sehî û Serhatiyên Sebarete Aştî, 2010.*
http://www.tarihvakfi.org.tr/tup/download/TV_final_rapor.pdf
- Projeya Cihê Perwerdeyê Wek Amrazeke Lihevkerinê di Ciwakên tê de Lêkdanên Ciwakî û Sîyasî Pêk Tên, 2010.*
http://www.tarihvakfi.org.tr/tup/download/TV_egitim.pdf